# CÎHAN ROJ

# *SÎSAR*

**Weşanên Taybet ên Kovara MEHNAME: 6**
Sal 2001
Copyright © Cîhan Roj & Kovara Mehname

# *Naverok*

**1. Tenûra dûdayî**
**2. Sî dişewitî**
**3. Keleha mérdîn bi demsalên xapînok vewerimiye**
**4. Tarî li çavan kila qîrî**
**5. Çilên ristan**
**6. Tiştên kelî**
**7. Parzûn**
**8. Bayê başûr**
**9. Tîna pênûsê**
**10. Silavên binebîran**
**11. Tîn**
**12. Axa ku ez diguvaştim**
**13. Can**
**14. Helbesyên rûçikî**
**16. Şivehelbest**
**17. Danên helbestê**
**18. Tayên ne rêsayî**
**19. Wêneyên dûriyê**
**20. Çiv**
**21. Şar**
**22. Çewkî**
**23. Piliyên reşemiyê**
**24. Reng**
**25. Pêşên bajêr**
**26. Ku meriv dibêje "ÎNSAN" avên çeman û kaniyan dimiçiqin**
**27. Çîrokêbêjê xav**

**28. Sîsar**
**29. Tamatêzên kal ên di kadînê de**
**30. Demê bîr de**
**31. Piriyên hevokan**
**32. Peya**
**33. Xew û xewn**
**34. Bihar**
**35. Hestîa**
**36. Reşbelek**

## *TENÊRA DÛDAYÎ*

*Ji refên gotinên çîrokan*
*hê jî peyvên ber bi roj ve girêdayî hene*
*bahr li ser masî dibe qalik*
*gotin dibe hulm*
*li ser awêneyê havên hildigire*

*Di bin azmanek tisî de*
*ji gezên sêvek tamsarkî*
*kevir dinalin*
*melodiyên şevên rêsayî şikeva*
*pênûs li tiliyên terikî*
*jana hiriya ne şehkirî*

---

*darek weke temenê xwe hişk*
**bûye aramiya bayek tenik...**

## SÎ DİŞEWİTÎ

### (A)

**Jan li min kartû dibin**
**ez di şevên çiriyayî de**
**pirtûkek im di keresiyên çiyê de**
**av mihek gêj e ,li rehekî tazî deng dide**

**Dem li min pelek cixarê**
**ez ji xwêdana destê hostayan**
**wek dilopekê mame li ser piyên pira Heskîf**
**lemên hêşîn li dengê bereyên sar**
**bûye devê birrekê**

**Ez peyayek li palên asê**
**bêhn zebeşeke kal e**
**bi tîna rojê li min distewe**
**kê ji me çira li reşahiyên qîrî hilda**
**bû kaniyek**
**li parîzên şoreşê der bû...**

**(Mirin mîna ava ji belekiyan**
**li ser kevirên saxsî zirav diherike**
**û roj di danan de kil li çava daye)**

**bayê mirinê li ser sînga derî lê dadayî**
**dişkest**
**mirin ! Tu dest bi gopal**

**ji çavên sergoyî de**
**daketî ser rê**
**tu û melkemot di heman rengî de veşartî ne**
**te çend payîz şewitand**
**çendî bihar bû "mûmya"**
**te di birînan de veşart**

**(Hemî çîrok dibin xwê**
**û di roniya çavan de dihelin**
**ma çi nehele**
**ev kurm gidî parçe ji yezdanan in!)**

**belê**
**di siya zinaran de**
**xwêdan li bijangan dimiçiqî**

**(B)**

## SERÎ Dİ SİYÊ DE SİVİK DİBÛ

**(Gotin, ji dev, weke goga berfê ku li ser sînga dayikekê gilêr bibe**
**carna dibû bêrîvanek, dev li hurmiyên çolan dişidand**
**mad lê tirş dibû;**
**û dîsa ,wek zarokeke Serhedî, dest li ser agirê ji darê mazî digerand)**

**"Di destan de lepikên ji tiftik ,**
**egal bi rêşî,**

**goreyên qerqaş**
**lingên piçûk ji berfê diparast."**
**ev gotin dibûn şekir û tîr ji devê pîrekê herikîbûn**

**min van gotinan li bejna wê birîn:**
**du çav hebûn li serî...!**
**rû girover**
**lêv ji pelan ziravtir**
**mircanên ji hestiyê yezdanan di dev de**
**hemî li ser tayek zirav bicih bûbûn**
**gotin bibêjî ji Mûrad kerrtir diherikî**
**reng ma;**
**ew jî li tariyê dibişkivî**
**bê kila ji kakilên gwîzên Dêrsim**
**herdu li çîrokên şoreşê germ dibûn**
**û**
**piştî şevekê li Stilîlê**
**den da demê**
**hinarikên li rû du sêv ji dara Xelatê**

**evînê li "yasna " pel vedaye**

**min hêviyên xwe di teştika**
        **nêrînên we de straye**
**waxta çavên te weke xêlî ez nuxamndim**
**ez bûm çivîkek li zinarên asê bê deng mam**
**li te lêv**
**keviyên belekiyên havînan kevn dikin**

## *Keleha Mêrdîn bi demsalên xapînok vewerimiye*

**Riya hevrêşîmî te dinase ji dema genim yezdan bû**
**pelek li bistiyekê asê mabû**
**bêhna rezên Awîna**
**bê li hêsiran kir benek**
**min xaleke şil li hevokan bar kir:**
**rojekê dê dest li te bibe marekî almastî**
**tilî li min bibe bêreke sifir**
**emê li gora Rêdar tovê we ji çiya de anî biçinin**
**destê te di dest evîndarê te de...**
**ezê wê çaxê ji te re bibêjim**
**mazûvantiya wê demê çima bû**
**girê êşan û li min asê ma**
**û dota vî gelî**
**ŞOREŞ ÇAVEK E...**
**JİN ÇAVÊ DÎ...**

**Tu bûyî êşek bi canê yezdanên hov ketiyî**
**Tu bûyî kaniyek di bahra Gilgamêş de derbûyî**

**(derî li "*yasna*"ya dawî vekirî hiştiye Zerdeştê Kal)**
**"*GÎTA*"**

**reng hatin şuştin**
***"yasna* "**
**ey tîna rastiya xav,**
**va dil li me seridî**
**rist nîr in li ser herdu çavan**

**sal ew sal bû**
**agir jîn dişuşt**
**tu xasa**
**li ber paceyê**
**gotinên kampên azadiyê**
**bûbûn dilopên şîrê payîzê**
**ji deşta lêvên te de tîr diherikîn**
**û**
**deng li mîlîs xaşiyayî bû**

**û**
**ez mam li bajêr**
**nav bazara rist û hevokan de**
**gîta heval gîta!**
**û**
**dibêjin dîwar li te xumama cixarê ye**
**jiyan ba ye lê dizîvir e...**

## *TARÎ Lİ ÇAVAN KİLA QÎRÎ*

**Maleke tarî , lê çemên biharê**
**febrîqeyên çixarê,**
**û hemî ayetên ji fenên împaratoriyan hûnayî,**
**fermanên li ser janên me dibûn parçeyên hişkerik,**
**gilokek ji berfê ye,**
**bi neçariyên stewr dihele**
**çem li pirtûkên bi zimanê xav diwerime**
**ji zarînên pirtûkan**
**min şitla li devê kaniyeke piçûk çandî bîrvekir...**
**çem bi gilokek berfê cîhanek da ber talana xwe,**
**kanî hê jî li reha xwe rast nehatiye,**
**malek û têde evîn bûye agir rûpelan dişewitîne,**
**hîrîna "Kileopatra"**

**û her gotinek li dor min dibe zinarek,**
**tîna riya ez tê de tîrqetîrqên "Kileopatra" ên fetisok dişewitîne,**
**hulma ji axînên Mem li maran dibe dûyekî tal î zirav,**
**û aniha dilekî azad biba kezîyên hevrêşîmî,**

**kenek û çîrokek evîn tê de gotinên şêrîn in li vê tariyê birista,**
**minê çayek girtî**
**û hemî çîrokên avlêketî bereda ser zimanê ruhê azad,**
**û ezê bi nermiya porê wê bi rê ketima,**
**çiqas xwêdan li min weke kaniyên Serhedê derbûba ,**
**minê bi siya tayên pişkivî**
**careke dî ristên evîna vî welatî birista**
**ev kêlî,**
**benekî rizî ye,**
**bêhna qotikê çixarê li hawara min hat,**
**û merheba însan,**

**hubur li evînên we diherike...**

**8.3.2001**

*Çilên Ristan*

**Min**
**payîz guvaşt**
**Bûm berxikek**
**Bi dawa pelan ketim**
**Min dizanî ku tu têna bê kur î**

**Min teneyek ax da ser dil**
**Balîf li min bû av**
**Çav li biskên te digerin**

**Hê di çilên ristan de me**
**Dev mane bê memik**
**Çav xayîz bê hêlkan im.**

**Tu li ber kevirên xayîz**
**Di bin siya ewran de**
**Dizanim ku li bextê min tîr dibî**

## Aştî Di Bêhna Axê De

(1)

Şorav e li birînê ayetên fedîkar
Sikak li şênî bûye gorên sitranan.
Dergûş çavan li sipî vedike.

(2)

Destê Kawîs
bêhna verişiyên
çiyayê vemirî de

(3)

Bezên ristan li me sar û germ tê
rû li ser kevzeyê; GERM
dest di gencîneya masiyan de ;TOR
zarok bi rûyên kal, refên keştiya şer in
li bajarên aştiyê asê mane.

(4)

Siya ewrên revok li pozên sorîn sar tê
dîsa gotinên tîr li birînê kewn digire
ax li tov bûye zinar

(5)

**Aştiyeke sitrana şevê**
**xêliyên spî şûr e**
**li ser rîşên reşeşîn**

(6)

**Ji vir salek beriya niha**
**reşêkan di çavên ziwa de**
**rê dida xwe**
**seyên kurmî bê sî,**
**gur xwe li rêça rûvî,**
**ax di bin berfê de dikelî**

(7)

**Di xwînê de deng hate çandin**
**Bi bûkanî, azev diman, berî niha**
**Qasî ku xeyal li stûyê te sist bû**

(8)

**Çi firot û çi nefirot!**

(9)

**Demsalek bûye aştî**
**tu xezalek e, li SÎPAN**

(10)

**Xewnên şewitî**
**balîf li kê kiriye av...**

(11)

**Biskên badayî bi dilopan ,**
**nebe kendîrê kenê**
**ev beroş bê av,wiha,dê çawa,**
**agir li xwe sar bike...**
**li ser nêrînên xama**
**ristên azev şîn tê**

(12)

**AŞTÎ TÊJIKA TEYRÊ BAZ E**

**Dİ BİN SİYA BİN PÊSÎRAN DE**
**NUKUL TER,BASK NÛ LÊ DİBİŞKİVE...**

## TİŞTÊN KELÎ

**Zarokek di destan de parçeyek nan**
**Çav li eylo**
**Nan di destê wî de**
**Gotin di devê min de bû hevîr**

**Ewran siya eylo,**
**Xeyalan zarok ji min veşart**
**Ta zarok bû dilop li ser dilê min keliya....**

## PARZÛN

**Çîrokek li gerdana pelên dil lêke**
**bi dengê tirîfroşê li Babisor**
**têde jana têlên kişiyayî.**
**gotinên kal û germ.**

## BAYÊ BAŞÛR

**Dîsa dengên sar bi ser me de tên**
**min deng li xemên kal pişkivand..**

## TÎNA PÊNÛSÊ

**Û dem kêliya li ber devê şûrê şêr**
**pênûs şara zirav**
**li stûyê min**
**bihar e , belekî hêsran sar dikin..**

**.**

## SİLAVÊN Bİ NEBÎRAN

**Di pêçeka ristên**
**axpînan de**
**silav serî dizivîrîne.**

## TÎN

**Dareke li devê şiveriyekê**
**li ser darê hurmiyeke çolan bibirîn**
**di dest zarokekê de kevirekî saxsî**
**weke pênûseke serberedayî**
**li dû azadiyê dilive.**

## AXA KU EZ DİGUVAŞTİM

**Vê havînê bû hê**
**kevirên çemê biber**
**çîrokbêj bûn.**
**moriyan li ser dîwarên koçberan**
**di devde hûrikek nanê sêlê**
**rê didan xwe**
**xew li min kartû dibûn**
**vê havîna çûyî bû**
**min *"Mala Xwedê"***
**weke pêşgîra evîndarî**
**bi bistiyek çavê xwe ve girê da**
**diya min bi *"Oxira Xizir"***
**awir vedida ber bi çiyayê bêserî ve.**

**NÎŞE; *"Mala Xwedê"* Ji bo Gimgim tê gotin.**

**CAN**

**"Kurê min rêket, çû welat":Ji devê dayîkeke Kurd ku li Kazakîstanê dijî "**

**Parçeyek ji canê min pêre ye**
**kurê min çû**
**bê Welat , em li vir dara bêkesiyê ne**
**çû welat,**
**dilê min gustîla azadiyê ye**
**di devê lûleyê de**
**heşt hezar kîlometro...**
**ezê bibim taseke av**
**ber bi kurê xwe ve rê bidim xwe**
**ezê şewata dilê xwe**
**bigihînim ewrên avis**
**dilopin ji çavên min birînan bikewînin.**

## *HELBESTÊN RÛÇİKÎ*

**(1)**

**Keleha Mêrdîn**
**morîka**
**li stûyê Mezopotamya**
**destê sibehê de**
**tenûra biratiya şikeva pêxist**

**(2)**

**parsûyên Adem**
**di holikên zarokan de**
**kevirek pûç e**

**(3)**

**Riya hevrêşimî**
**wek gula li ser gora Xecê bişkivî**
**refên tîrêjan**
**xemên kal venaşêrin**

**(4)**

**Berî stewr e îsal**
**parçeyên ewran weke Beko**
**nêzî koyan dibin**
**kofiyên di rengê aştiyê de**
**sêvên li ser sifreya di şevdêriyan de ye**
**her rêşiyên li eniyên gewer**
**di kûrahiya hêkên Mîrê Hêkan de bê têl**

**(5)**

**Gotin li stûyê min dibin çirayên pêketî**
**peyv di çaroxên çîrokan de dibin xwêdan**
**dev bê kef**
**lêv sorespî**

## ŞIVEHELBEST

**(1)**

**Ez bahr im**
**ma tu dikarî**
**min di bêrîka xwe de veşêrî**

**(2)**

**Di peyvên bê pizdan de**
**silavên me hen in**

**(3)**

**Ev rêwîtiyên bê pêsîr in**
**ev çûyîn**
**bi dagerîneke bi pêsîr re tirş dibe**

**(4)**

**Bi çend peyvan**
**agir bi evînê dikeve**
**tu ranehêjî satila**
**bê av,**
**dê bi hatina te bitemire**

**(5)**

**Aştî ceng e**
**çekan dirizîne**

**(6)**

**Hewa di destê min de benek e**
**dikişînim**
**naşibe zincîrê**
**ne jî dişibe hevrêşim**
**hew rengê wê**
**ji rengê berfînên virnî spîtir e**

## DANÊN HELBESTÊ

**Roj li seranserê hestan germ bû**
**hemî peyv bê hevalkiras in**
**li alî malê**
**hinan jê avzelalî dikim**
**nalîna hevokên teşenekî**
**ji pirtûkên tazî tê**
**ben li stûyê ga sist dikim**
**ev topçîn jî dimîne erda xalî**
**ezê kafesokan**
**bi bêhnên cixarê livbaziyan**
**lidardixim.**

## TAYÊN NERÊSAYÎ

*Prîska tenik bi tariya ji xaniyên sotî*
*li lingên çivîkekê pênûseke*
*xêzên soreşil li asîman vedireşîne*
*asîman cotgûliyên keçikekê*
*rû li kevirên girnîş germkirî*
*xwêdan di lêvan de rê dide xwe*
*dest li darhêşînokê rapêçayî*
*baskên çavan konê jînê*
*bê stûn vegirt*

## WÊNEYÊN DÛRÎYÊ

Li sikakên tewteweyan
    mêvana keleha Qedîfe
bi çavên xama
bejn û bala xwe
    li rêveçûyînên zarokên koçber girêdaye

çirîna deriyan
xwêdan li şalpeyên rengîn golgirêdaye
çavên min
ji çavên dregûşek xayîz bêhtir
        kûr dikelin
bi min
derî li hevokên gewez bangan sar dikin

## ÇİV

**Îbrahîm li agir bûye av dîsa**
**dîsa dem dibe destpêka çîrokên neguvaştî**

## ŞAR

**Di paceyên kargehan de can zirav hildibin**
**askor di teniya bazarên sayakî de**
**ji birînên sar reştir ...**
**di pêçeka koçberekî de**
**dergûş ji pûşê payîzê siviktir**
**dîsa bûye mij û dûman**
**tê de berxik bi devê gur ketiye...**
**keçikek ji bazarê tê**
**li ser sînga wê sêv in**
**bi hêlek sêvê ve çavan girê dide:**
**"Va ye rengê çavên min"**
**alî sêvê ê dî dest reşeşîn kiriye:**
**"Ev e , jiyan bi vê re serî daye rê..."**

## ÇEWKÎ

**Tarî pelek e**
**ta bi kevir ve neyê girêdan noqî avê nabe**
**ronî av e**
**ta li zinara asê nemîne**
**deng nade**
**deng ax e**
**ta li dest nekelî**
**meriv pê hişyar nabe**
**hişyarî dengdayîne**
**ta têlên xam nebe pel û bi ser avê nekeve...**

**Ax deng e**
**Ronî xav e**
**Deng av e**
**Ronî deng e**

**Av jî tê çandin ji deng nermtir**
**di deng de jî ronî di serî de**
**di dest dayîka min de bû dergûşek û bi dû bayê hêviyê ket...**

## PİLİYÊN RESEMİYÊ

(1)

**Dastan tirş bûne**
**di demê de hilnayên**

(2)

**Şar dilopên peritîne**
**di ser kenên kartû de datên**

(3)

**Ku bi tena serê xwe dimînin,**
**pênûs şivên ter**
**sivî li ser pişta hevokan**
**têde bermahiyên ji mexelê însanên weza**

(4)

**Wextê evîn li te weke pûşê di hêlînan de hişk dibe**
**hest li min dibe reşêkên Avrêlê**
**û di ser me de kalîna mihek dev bi birîn tê**
**bayê kuştina agir**
**bi xwêdaneke sar re diherike**

(5)

**Ez jî li gewdeyê te pişkivîm**
**tu çawa tovek î ji canê min**
**ê germ û xav**

(6)

**lêvên dergûşa xayîz**
**li morîka pêsîran dişemitî**
**di kelemekê de**
**kî ji me hov, nazdar, sivik,bi helkehelk reha şinahiyê**

**badida**

## RENG

**Ku te bi hêşîn den bikim**
**ezê li bendê , ta rengê Dîcle ji te neyê dîtin**
**ku te bi deng ve girê bidim**
**wê melodiya dengên li şikeftan olandidin**
**li te tîr bibe**
**ku bibim zarokek û bi xeyalê te bikevim**
**dê xeyalên te biherikin di ser min de**
**di siya bi tên de xew li çav germ bibe**

**ezê du gotinan nerm badim şikeva, bi dan...**

**pêşên bajêr**

**(1)**

**Dem ku weke şalpeya azevek**
**li bê şermîn diperite**

**(2)**

**Taya kulîlkên li pêşa bajaran**
**pişkivî li mirinê germ bûye**

**(3)**

**Li buhurê navbeyna hest û jînê**
**cotepeyv zewicîn.**

**(4)**

**Di çemê rengan de**
**deng li ristan dişewitî**

**(5)**

**Şev balîfek ji baskên payîzê**
**tov li ser sînga hêviyan diterike**

**(6)**

**Pişt li me bistiyên bîhokê**
**reh bi avê dileyîze**

**(7)**

**Ji nîvê xewna serberedayî de**
**peyayên li devê çeman**
**xîmê hevokan rêz dikin.**

**(8)**

**kalekî bê diran**
**lêvan li qalikê zebeşê şidandiye**

## KU MERİV DİBÊJE"ÎNSAN" AVÊN ÇEM Û KANİYAN DİMİÇİQİN

* Tenêtî pariya qirşekê ye,
di lemîna avên biharê de
nêrînan didize
*Fikir barîda şil e ,
li ser sînga jineke Kurd;
bi şewatê re diteqe
bi hêsran re tevlî koka kulîlkan dibe

* Ked evîna axê ye
bi peyvekê re derdibe
bi maçekê re diherike
bi xeydekê re sedan Sal dikûje...
*Rexneya herî ter nêrînên zarokan in;
ku bê ajotin dunyayê dihewîne,
ku neyê dîtin dibe kurmek li nav hiş...
*Tu yezdanî ew hêz di xwe de nedît ku
navê yezdanê ziman li xwe bike.
*Hin deng û derkirin hen in;
di xewnên kûr û dûr de li derî didin!
dibin av û çavan li berbangan dipişkivînin...
*Hin mirov hen in ku agir li ser sîng dişewite
li keviyên çemên nenas li benda
hêsrên xwe dimînin

*Tarîtî ji bo gelek kesan ,
hevalkirasê jinên wan ên rizîne;
ku biçirînin dê çîpê jinê xuya bikin!
*Ken û razanên jina bindest
mîna şaneyên rîşê ne
ku însan dereng hay jê çêbe dawî mirin e...

***Di siruştê de tu tişt ne ewqas geş e ku**
**bi qasî kenek ji dil şêrîn be...**

***Ev biwêja bi Kurdî mifteya hemî destpêkan e:**
**"Ku meriv dibêje ,însan, avên çem û kaniyan dimiçiqe..."**

***Dem sî be,**
**gere meriv wê weke temeziyê li çavê xwe girê bide.**

***Ew kesên bihestîyar di şeran de her kêliyê de dimirin**
**lê tu wext nikarin kesî bikûjin.**

***Ew kesê ku çi gotibe û bi cî anîbe**
**xezaba yezdanan jî vedikişîne!**

***Kinfa dema em tê de ne,derewên bûye rastiya mezin, in...**

***Pirtûk kewa kedîkirî ye di warê bê nêçîrvan de...**

***Huner gustîla dergîstiya gel û azadiyê ye..**

***Bi her xwendinek dastana "Memê Alan" re**
**bihustek dî ji erda dilê xwe didim hevala xwe!**

## ÇÎROKBÊJÊ XAV

**Du tilîkan weke devê gur vekir,**
**dengê bê û bahozê bi xwe xist**
**çav li keçika Çar salî mîna tas:**
**"Dayê , Aso di bin min de mîzt" got**
**û li stûyê diya xwe bû beneke ter**

## SÎSAR

**Şirîna tariyê bû bê pêl diherikî,**
**di nêrînên avis de roj diçû ava...**
**ji biskan de agir di xwêdana kekê min de vedimirî**
**şûna lingê wî wêneyek li dîwarê xwe digerî**

**Bi baranê hate şuştin,bi pelan hat nuxamtin**
**dewrêşên şoreşê di tariyên rizî de lem li bext vedigirin**

**Diya min laçik li hêsiran kiribû bend,**
**deng li gorê diçand:**
**"dilê min rê dikişîne**
**xewn li min sikesar,**
**vaye min dil dîsa li ber serê te hişt."**

**...**

## TAMATÊZÊN KAL ÊN Dİ KADÎNÊ DE

(1)

**Bi ristan , di axa helbestên buharê de**
**gotin ter dibin,**
**bi siya pîrikê re silav di bin giraniya peyvan de**
**gulî xar.**
**ma kîjan hêwî dixwaze ber êvaran de**
**bikeve riya mal,**
**kîjan şivan bi bilûr , bi dergîstî**
**bê deng dimîne.**

(2)

**Bistiyê ter li ser agir**
**di bişkokan de li agir derdibin.**
**dilê min kadînên Serhedê,**
**tu êşan weke tamatêz û hurmiyên çolan,**
**têde sor bike.**
**dengê te li min kûr û zirav tê**
**koremişk bi reh û koka vê evînê ketine.**

(3)

**Qasî ku pêjgîr şil bike ,ava Kaniya Yado,**
**bi qasî pifika dergûşek bêhna Dêra zafaran,**
**awaz li têlên bê darik germ dike.**

**li ber sura zozanan tewafên însan**
**li me pişkivîn,**
**gotin li devê hinekan bûye werîs**
**di çîrokên Beko de dirizin,**
**ev e kêra li ser dilê min,**
**reng li ristan sor dike.**

**(4)**

**Baran li axê bû kulmek av ,**
**di tîna pêçeka dergûşek sê royî de**
**bi qere lastîkan ,dayika min**
**bi kaşê nermok ve hildikişe,**
**reşêk e**
**dilop ji pelan de datên ser pelan.**
**helkîna kerî pezê li xwêdanî rastkirî**
**li ber dengê peyvên beza sar dimîne.**
**li Başûr çîroka Dalê,**
**bûye xemên şevan li min,**
**tiliyên min di rengê tiliyên**
**tûtinkêşên heştêsalî de ne.**

**(5)**

**Ezê her pirsekê weke parçeyek**
**ji canê xwe bikim rêsî**
**li ser benê ji gihê**
**dê bi çavên te hişk bibin**
**û di zivistanên Serhedê de**
**ji çîrokbêjan re bibe bêhn**
**da ku kêliyên xewreçûnê li te sar bibin.**

**(6)**

**Gumanên li ser stûyê te bûne nîr**
**bê kurm**
**bi hulmên zarokên li sikakan**
**bi bê berêvarên havînê de**
**dê bipişirin.**

(7)

**Aha, dîsa ji Başûr**
**dengê kilamên pepûkê**
**cîger li min sêla sor**
**derbên sar jinan di axê de**
**veşartine.**

(8)

**Îşev pênûs delavek**
**li kaşên şaxên Bêhngolê**
**rêya li min sivikbûyî**
**tîneke li belekiyên hesinî**
**ber bi pişkivuna berfîn**
**hoke hoka şivanên Bêrtî ve diherike.**

(9)

**Ezê kulmek ji axa goriyên par û pêraran**
**li bin serê xwe raxim**
**weke dergûşek bi germahiya pêçekê,**
**şevên sar mîna qurtek av dadiqurtîne.**
**çend çîrokan bikelînim**
**bi kela lorîkan re di tenûra helbestê de**
**bişewitînim.**
**Başûr,**
**du bejn ji sînorên bênamûs dûr,**
**û dostaniya helbestvana bûye bûka hestan.**
**bîranînên wênesazê bi çek**
**hêjî kirasek şil e**
**di çileyê xedar de,**
**pêştemala êşa heyî ye.**
**tayê porên kej ku li dar û keviran pêçayî.**
**dê heval bi awayê zilamên Qoserî,**
**balîf li sînga xwe bişidîne,**
**ji çavên dayikan çend nêrînan birêse.**

(10)

**Çerxeke bê felek**

**siya dara dunyayê ji me veşartiye**
**her ristek di devê kesan de,**
**cûnek benîştê kerengan**
**hêvî bi tolaz kal e.**
**bi bêhna hevokên nêremo**
**me dil li xwe reş kiriye,**
**way li min e,**
**li kolanên biyan,**
**ziman li kesên me**
**bûye kevirê êş**
**genimgêlan dihêre;**
**ez nizanim,**
**rewşenbîrên nikarin ,xwe bi zimanê**
**zikmakî derbikin**
**çawa tilî ji bo gustîl dirêj bikin...**

## (11)

**Wîî, bê gazin!**
**hew bi xatir!**
**serî bidim riya helbestê!**
**ez, weke kesek kurd**
**bi axek bindest gojîbûyî**
**çawa Beko ji bîrve bikim...**
**min bi van çavên ji ber êşa serî**
**reh lê firehbûyî dît;**
**şevek xedar ên Serhedê de**
**ji ber ku bûk dergûş lala nekiribû**
**bi çoyê şivanî**
**mêr can li wê kiribû sêla reş**
**û bûk li ser reşêkahiya kadînê**
**sibe li xwe anî,**
**gurçikan hew sê Sal bûkê li vê dunyayê hişt**
**destê min li ber demeke kin dilerize**
**bi van çavên sews min dît ku,**
**sawa cendirmeyan**

**çawa ji dilê bavê min bû marek û**
**li pala eniya dagirkeran kişiya,**
**her jinek cîran**
**çawa bû sêvek xelatê**
**bi tîna azadiyê sor bû.**
**wan çiyayan**
**bê ka bi keda şêrên xwe**
**çawa xem,xewn û xeyalên rizî**
**di xozanan de şewitand**
**û tov lê reşand.**

**(13)**

**Di vê riya hade reşbelek li min bûye hêsir**
**dergûşek piştî jana dil**
**bi kêf li memikan bi çi hêzî tê xezebê**
**bi wî awayî**
**ez li kana hestan dendik bi dendik**
**diherikim.**
**benên helbestê dişibe doxîna**
**kalek , ji bo avdestê sist girê daye**
**ji bo ku ew derbên min beredaye**
**navbeyna eniya ristan**
**tu lêborîn ji te naxwazim**
**te tu car ji ber bêhna kincên karker**
**dest lê sist nekiri ye**
**ji min hêviya gotinên parsekê**
**bê tûr neke**
**ger gotin li ser sînga şevê**
**reng nede xwe**
**ezê bi çi dilî bikevim ser riya rezê te**
**min dil heye şivek ji dara Homeros**
**li ser helbesta tazî bihejînim;**

(14)

**Keçikên bavên feodal**

**xwe li paş deriyan vedişart**
**hê jî li asîmanê heftan**
**hewr li royê asê dimînin**

(15)

**Deng li min reha spîndarê**
**xwe li çemê**
**dikizire girti ye**
**ez ne di tu dengî de me**
**bila şev destan li te pevnexe**
**hemî "ez" çivîkên ji refê te ne**

(16)

**"Wey te pê li ser çavên min kiri ye"**
**berstûka dergûşa bi nav lepên**
**seyê beredayî dikeve**
**leza çi dide xwe**
**ez niha bi wê lezê li ser xemên te dihelim.**

(17)

**Ew dengê ku li ser lêvên**
**keçikên Başûrî dişewite**
**bendavên bi hesretê bê av hişti ye**
**ne sînorên bênamûs bûya**
**dê min bi bûhayê şalek**
**sibehê berî bida peykerê Kawa**
**weke kesek welateken xama,**
**di destê minde qevdeyek palaxa devê Mûnzûr**

(18)

**Çavên li ber tirîreşkan reng dialêsin**
**li ber pêsîran qevdeyên gulên bagerê vehewandin**

(19)

**Vediweşîne**
**berf tozik**
**ba ji alî Kur de**
**şara li navkêl**
**gol girêdaye;**
**bi nermiya xalxalokan hildikişiya**
**berf egala egît veneşêre**
**ji çavên serê min**
**du moriyên hesteyî**
**digot**
**bila di delavên Kaniya Qestelê de**
**bibe masiyek nîvçe.**

**(20)**

**Bi çi veceniqiyan min pênûs**
**weke hespê hêşpêlî**
**bereda keskayiyên şaviyan**
**hêvî li me hatiye xaxê şadiyan**

## DEMÊ BÎR DA

**"Ku tu çûyî, bila temiya min li te be..."**
**        van dûriyan , bi vê gotinê , rêwitiyê li însan dikelînin**
**bihar e, Dumuzî li erda xeyalan kon vegirtiye**
**dewsa lingên zarokan de**
**        nêrînan radixim**
**                di sivînekan de çîveçîva têjikan**
**                        dilop di keviran de rê didin xwe**
**ez li wî warî me**
**        bêrî li min venamire**
**di şûna "Ku tu çûyî, bila temiya min li tebe**
**                ji hemî kaniyan av vebixwe,**
**                dest li rû erdê de , bila , ji te êşan bikêşê..."**
**"ku tu çûyî wekalê silavan."dê bibihîzim**
**        evqas kurt**
**ta dîsa li stûyê însan dişide...**

# PİRTIYÊN HEVOKAN

**Dû ziraaav hildibe dîsa**
**rêzên kartû li ser pelên pirtûkê**
**şirdanên hişk in.**
**Di şoreşa peyvan de**
**hezaran Sal bûne aniha**
**niha jî li hemî deman distewe.**
**lingên xwas**
**riya dirêj**
**can li min bêjing**
**her kaniyek lê derbûyî**
**wêneyek dihewîne**
**ku gavek biavêjim**
**wê rez û bîstan**
**"dest biavêjin pêsîra min"**
**dê ax li birînên ristan**
**bikewe**
**rehên wendayî li bîra ziwa derbin**
**pirtûk**
**hors û çakûçên honazan**
**serî li min tûj dibe**
**lê ez xam gihê çûrik**
**bêrîvantiyê**
**ez revandim:**

**çîrok piştî parzûnkirinê**

**qusiya**

**BARİNC berê vê kedê tortek bi xwê**

**heta li beravên Geliyê Bedlîs**

**xew li me şêrîn nebin**

**wê stranên muzîkjenên me wiha bişibin**

**qîştînê refên li erda ajotî**

**û helbestên me weke erda kaniyên miçiqî**

**hişk bibe!**

**û "ez bi qurbana we"**

**we careke me kir ser vê riya ...**

## PEYA

**Peyayek ji çiya de xweş dihat bi dil û can**
**zinar lê wek kolanan**
**lem dabû gul sosinan**

**sala par bûbû heval**
**pişt daye deşt û çiyan**
**bûkeke li gelî û zozan**
**ku de diçî tu ey hozan**

**berfa sipî reng da rû**
**bêdeng man darên berû**
**birîn li berxê min sar bû**
**wayî bira hoyî bira can bira can**

**Serhed çima ro li te nayê**
**xort veşartin ba û berfê**
**desmala sore gewez**
**qertel hilgirt bi bayê bezê**

**dayê xort li Serhed bû**
**çemê xewnên şevan bû**
**tê de govenda zeriyan**
**ne bihar ne havîn bû**

**wayî bira hoyî bira can bira can**

**kî gul çandin kê anî**
**hilbû agir li banî**
**rê ev rê gel serî lê danî**
**dil bûne çem û kanî**

**wayî bira hoyî bira can bira can**

## XEW Û XEWN

**Dest li rû kir stûn:**
**"Li ser heft çiyayan ,li paş heft deriyên hesin**
**moriya xewê di guh de razayî bû**
**pişîna dêwê heftserî hay ji bayê felekê nîn bû**
**Sal çûn, meh çûn, roj çûn"**

## BİHAR

**Pêşî hewrên reş û giran asîman vedigirtin**
**dengê baranê diherikî cohoyên stranan**
**av radibû,li pêşên çeman pîvokan reng dida**
**quling û reşêlekan bang didan:**
**"Bihar hat, bihar hat..."**

## HESTÎA *

(1)

( Hê jî hest xav in
erda deng lêketî di tama gotinên yezdanî de ye
Hestîa!)

(2)

Jan rê dikişîne
ayet li şevbuhêrkên dûriyê kartû dibin
hevalan,
bes ala navan û navdaran di çavên me de daçikînin!
ez ku ji jana sînoran
di tîrbûna kuxtîna tirpankêşên serhedî de dikuxim
li paş têlên mezata peyvan sikesar diricifim

Kî û kê di çi mercî de çi helbest nivisî ye!
tu ristan li ewrê destê biharê bar bike
û her derê biharan peyvan careke dî biajo
vê axa ha
çendî yezdan birêkirine...

(3)

(Genim û ax
hezaran Sal kevnkirin
Demeter* çavek e li hilberînê dipişkive)

Gunehê hezaran salan kîjan bajarê wendayî de veşarî ye,
çendî bar peyv di Riya Hevrêşim de hatin şêlandin,
weke koledarek tazî bi meya talankeran bû bêhneke tûj,
û ez bi gorî ev ziman weke zozanên Bêhngolê,

**hew di rêwîtiyên demî de însan nexweş dixîne!**
**tu dikarî kon lê vebigire,**
**bê ka di govendê de kî û kê hen in;**
**dixwazî temezî ji Îştar werbigire,**
**an serî li yasna yan sist berede,**
**û hêma,**
**ku tejî tov çandibe**
**rê li çemê Dastana Memê Alan vebike,**
**dê diya berxika gojîmestî çiqas guhanan li xwe sist bike...**

**(4)**

**Li min sar tê**
**basa pizikên li derdor birînê;**
**helbestên ji xwendevanên "platonîk" re hatine nivisîn tobeya ko ye...**

***Hestîa û Demeter keçên Rhea ne ku yezdana mîtolojîk e.**

## REŞBELEK

**Weke serseriyek bişev ji sikakan averê be**
**ez bi heman serseritiyê ji wê bajarê averê bûm**
**qasî dergûşek bi dilsarî**
**û barek besî karwanên çîrokan ma li ser pênûsa min**

**li helbestên her roj bi dûriya min ez şermezar dikim ecêb nemînin;**
**wêneyek li dîwar ji wan re bûye kan û kanî**
**û ew ji min serserîtir;**
**weke Qirixan , ji evînê , her dever ji birînên kêrên kol**
**ji xetên cot kûrtir.**

**Weşanên Taybet ên Kovara MEHNAME: 6**
Sal 2001
Copyright © Cîhan Roj & Kovara Mehname